

BULTENA ÇALAKIYN JINAN LI BAKÛR Û
ROJHELATÊ SÛRIYÊ/ROJAVA



**Meclisa Jinan a Giştî
pirsgirêkan dinirxîne û ji bo
pêşxistina xebatên jinan
nêrînek diyar dike**

Meclisa Jinan a Partiya Sûriyeya Pêşerojê li-gelek parêzgehan civînên rêxistinî li dar xist , Ji bo guftûgokirina pêşhatên siyasî yên niha li Sûriyê, bi taybet piştî rûxana rêjîma berê û desteserkirina hikûmeta demkî. Girîngiya beşdarbûna jinan di nivîsandina Destûra Bingehîn a Sûriyê ya nû de û rola wê ya girîng li herêmen Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku jinan bi bandor û nasnameya xwe ya siyasî di têkoşînê de îbat kirine hate destnîşankirin.

Di nîqaşan de her wiha bal hate kişandina ser pêwîstiya polîtîkayên şerê taybet bi pêşxistina hişmendiya jin û gelan , û bal kişandina ser projeya neteweya demokratîk weke rêbaza çareseriya krîzên heyî.

û Rewşa rêxistinî ya Encûmenê û kêşeyên li pêşiya wê hatin gotûbêjkirin, bi tekezî li ser girîngiya hemahengî û perwerdekirina berdewam ji bo yekkirina pîrensîpên Encûmenê û bidestveanîna rêxistineke hizbî ya bihêz ku bikaribe di qonaxa pêş de bi rê ve bibe û nûneratiya jinan di warê siyasî û îdarî de bike.

Ji bilî rewşa navdewletî û bandorên wê li ser qada Sûriyê, û ronîkirina nêrîna partiyê ya paşerojê û pêwendiya gel bi qonaxa niha re.

Gotûbêja rewşa jinan di civakê de ji aliyên curbicur ve, pêşkêşkirina zehmetiyên li pêşiya xebata wan û lêkolîna rêyên derbaskirina van kêşeyan bi armanca bilindkirina rola jinan û berfirehkirina bingeha girseya jinan a partiyê. Civîn bi vekirina qada nîqaşê û bersivdayîna hemû pirsan bi dawî bû.





Meşên girseyî li Rojava/Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo piştgiriya Hêzên Sûriyeya Demokratîk û Yekîneyên Parastina Jin

Di çarçoveya çalakiyên gel ên ji bo piştgiriya Hêzên Sûriyeya Demokratîk û Yekîneyên Parastina Jin de, li Rojava/Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê meşên girseyî hatin lidarxistin.

Beşdarên pankartên bi nivîsa “Em berxwedana gelê Nisêbînê silav dikin” û

alên Hêzên Sûriyeya Demokratîk, Yekîneyên Parastina Gel û Yekîneyên Parastina Jin hilgirtin.

Meş bi deqeyeke rêzgirtinê ji bo rihê şehîdan û berzkirina dirûşmeyan destpê kir.

Piştî axaftin hatin kirin û bal hate kişandina ser yekitiya xaka Sûriyeyê û li dijî êrîşên dagirkeriya Tirk û hemû êrîşên dagirkeriyê rawestiyên.

Wan amaje bi qonaxa hestiyar a ku herêma tê de derbas dibe piştî rûxandina rêjîma Esed û çawanîya xêzkirina nexşeya Rojhilata Navîn kirin.

Gotin: “Îro yên ku daxwaza radestkirina çekan ji Hêzên Sûriyeya Demokratîk dikin, ew in ku bi pêşengiya dagirkeriya Tirkiyê hewl didin Sûriyê hilweşînin.

Her wiha şervanên li Bendava Tişrîn û Pira Qerqozak silav kirin û diyar kirin ku ew amade ne tevî berxwedanê bibin û ji bo parastina xaka xwe çek hilgirin, û Meş bi qîrîna dirûşmeyên “Bijî Berxwedana Hêzên Sûriyeya Demokratîk” û “Bijî Berxwedana Bendava Tişrîn û Pira Qerqozak” bi dawî bû.





Yekemîn Foruma Şêwrê ya tevger û rêxistinên jinan li bajarê Heseke hate lidarxistin

Li gor şert û mercên niha û pêşhatên dawî li Sûriyê piştî rûxana rêjîma Esed û hatina rêveberiya Heyet Tehrîr El-Şam ser desthilatê, Kongra Star bi hevkarîya rêxistin û tevgerên jinan li bakur û rojhilatê Sûriyê, forumeke şêwrê ji bo gotûbêjkirina rewşa jinan li Sûriyê li dar xist.

Wan got ku di nava 13 salan de Rêveberiya Xweser li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku hemû pêkhate û mezhebên Sûriyê di nav xwe de dihevine, nîşan daye ku nêzîkatiya beşdariyê ya ku mafê ajotinê dide jinan, yekane rêya avakirina rêgezeke dadmend e. Jin li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê êdî li bendê ne ku mafên xwe bidin wan, bûne biryarder.

"Piştî rûxandina rêjîma Esed, em derbasî qonaxeke dîrokî li Sûriyê bûne, qonaxeke îsbatkirina rewşa hemû pêkhateyan."

Her wiha hate gotin, "Jinên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di nava şoreşê de destkeftiyên mezin bi dest xistine, ji qada siyasî bigire heta qadên dîplomatîk, leşkerî û yên din."

Li dijî koletî û neheqiyê li ber xwe da, destkeftiyên şoreşa xwe ya bi salan parastîye û heta niha jî li dijî polîtîkayên dewletên kapîtalîst ên ku li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û herêmên din dixwazin nasnameya xwe ji holê rakin têdikoşe.



Wan destnîşan kirin, "Em nikarin tiştên ku li herêmên din ên Sûriyeyê diqewimin ji bîr bikin , ku em berdewamiya ramana mêran a radîkal li eniya pêş dibînin. Rêveberiya Heyet Tehrîr El-Şam, li şûna ku ji ezmûna Rêveberiya Xweser derbikeve. Rêveberiyê hîlbijart ku jinan dûr bixe û rola wan tarî bike."

Wan tekezî li ser pêwîstiya avakirina Sûriyeye nenasendî, azad, demokratîk û wekhev kirin ku tê de jin di hemû warên jiyane de hevparên tam bin, û bang li hemû jinên Sûriyê ji hemû herêm û mezhebên cuda kirin ku bi yekrêziya xwe rabin ji bo gihîştina bi armancên xwestin û pêşkêşkirina nimûneyekê ,ji bo nifşên pêşerojê. Piştê jî daxuyaniya dawî hate xwendin û tê de hate gotin ku qurbanîyên ku me dane, êşên ku me kişandine, paşeroja bi milyonan mirovên koçber bûne, metirsiya ku jin û gelên vê herêmê li ber xwe didin, pêwîst e. Em weke jin di vê qonaxê de bi awayekî aktîftir beşdar bibin. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevî êrîş û gefên ku em rastî wan hatine, di nava 13 salên derbasbûyî de di pêkanîna modela neteweya demokratîk de bi ser ketine , Piştî rûxandina rejîma Baas, Ji bo ku ev modela serkeftî li seranserê Sûriyê belav bibe pêwîst e tedbîrên bi bandor bînin girtin.

û Di biryarên daxuyaniya dawî de wiha hat gotin:

Piştgiriya danezana Meclîsa Jinan û pêkanîna çalakiyên bi bandor ji bo garantîkirina azadiyên jinan ên di peymanê civakî de hatine destnîşan kirin, û misogerkirina beşdarbûna jinan ji sedî 50 di Konferansa Neteweyî de, bi nûnertiya berfireh a jinên ji gel û baweriyên cuda. Tevlîbûna jinan di komîteya nivîsandina destûrê de, û nehiştina destwerdana mafên jinan ên kar, xwendin, rêwîti, şewaza jiyane û cilûbergan.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê garantiya azadiya jinê bi.



Civîna şêwrê ya Encûmena Jinan li paytexta Sûriyê Şamê

Meclisa Jinên Sûriyê civîneke rawêjkariyê li paytexta Sûriyê Şamê organîze kir, bi armanca pêşxistina diyalogê di navbera jinên Sûriyê yên ji herêmên cuda de, û gotûbêj kirina rola girîng a jinan di avakirina pêşeroja Sûriyê de nêrîn û pêşniyar li ser çawaniya bihêz kirina jinan û bilind kirina rola wê di qonaxa pêş de.

Di destpêka civînê de, Encûmena Jinên Sûriyê hate nasandin, ku ew platformeke niştimanî ye, ku armanca wê bihêz kirina jinên Sûriyê û bilind kirina beşdariya wan di hemû warên jiyanê de, û kar ji bo beşdarkirina wan di pirosesa biryardanê de, û bi vî awayî rola wan bilindtir bike , di pêkanîna aştî û dadmendiya civakî li Sûriyê.

û Beşdaran li ser kêşeyên ku jinên Sûriyê di şert û mercên niha de rû bi rû dimînin, bi taybetî ji ber berdewamiya krîzên siyasî, civakî û aborî axivîn.

Wan herwiha tekezî li ser giringiya zêdekirina perwerde û rahênanê kirin, ji ber ku beşdaran fikra destpêkirina bernameyên rahênanê bi mebesta jêhatîkirina jinan ji bo beşdarbûna bi bandor di karûbarên siyasî û civakî de, di nav de zêdekirina şarezayên wan di rêberî û danûstandinan de, ji bilî piştgiriya jinan pêşniyar kirin , û projeyan bi taybetî li herêmên gundewarî û bi bandor.

Wan bang li beşdaran kir ku tekezî li ser giringiya bihêz kirina diyaloga civakî û berfirehkirina çarçoveya danûstandinên niştimanî bikin da ku zêdetir jin ji pêkhatyên cuda beşdar bibin.



Civîna rawêjkariyê bi komêk pêşniyaran bi dawî bû, bi taybetî "zêdekirina hêza siyasî û aborî ya jinan bi rêya bernameyên berfireh ên

piştgirî û vejenê, û xurtkirina hevkarîyên di navbera sazîyên jinan û civaka sivil de ji bo bidestxistina armancên hevpar ên ku xizmeta pîrsgirêkên jinan dikin."

Ji bilî xurtkirina hewlên ji bo parastina mafên jinan û rûbirûbûna cudaxwaziyê di hemû waran de, daxwaza beşdarbûna jinan di nivîsandina destûra Sûriyê ya paşerojê de û dabînkirina wekhevîyê di wê de, û berdewamkirina kar li ser avakirina toreke bihêz a piştevaniya jinan ji bo pevguhertina ezmûnan û pêşxistina Hevkarîya Jinên Sûriyê."

Di dawîya civîna rawêjkariyê de, beşdaran tekezî li ser berdewamiya xebata xwe ji bo bidestxistina armancên meclisa Jinên Sûriyê kirin, û beşdariyê di avakirina civakeke demokratîk de ku rêzê li mafên jinan bigire , Ew derfetê dide wan ku bi awayekî aktîf beşdarî di teşkirina paşeroja Sûriyê de bibin.

Her wiha bal kişandin ser girîngiya diyalogê berfireh ji bo Sûriyeyîyan û bal kişandin ser girîngiya mafên jinan û têkoşîna wan a li dijî zihniyeta baviksalarî.

Her wiha gotin, "Divê hikûmeta nû di qada xebata xwe de azadiyê bide jinan û xwe ji neheqî, stemkarî û serdestiya yek ramanê dûr bixe, ji ber ku Sûriye cihê reng e."

Ji ber vê yekê ez hêvî dikim ku hemû rojnamegerên jin ji bo dengê jinan bigihêjin bihîstinê û bigihêjin daxwazên xwe biçin rêxistin û meclîsên sivil."

Ji bo sîdwergirtin û veguhestina ezmûna Meclisa Jinên Sûriyê û belavkirina wê li tevahiya Sûriyê, pêwîstiya xurtkirina civînên bi vî rengî, herî kêrmeşê carekê, hate tekezkirin.



Rêxistin û tevgerên jinan êrîşên dagirkeriya Tirk a li dijî konvoya sivîl şermezar dikin

Gelek tevger û rêxistinên jinan daxuyanî dan têkildarî êrîşa li dijî karwanê sivîlan ku ber bi Bendava Tişrînê ve diçû de, ku di encamê de rêveberê Komîna Zenobîa Kerem El-Hemad jî di nav de 3 sivîl şehîd bûn û 15 kes jî birîndar bûn .

Di berdewamiya axaftina xwe de ev tişt hatin gotin: “Tevî rûxandina rejîma Esed a zalim û veğerandina azadiya gelê Sûriyê, êş û azarên gelê me li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ber dagirkeriyê û êrîşên wê yên dubare li ser herêmên me berdewam in , hedefgirtina karwaneke sivîlên gelê Bakurê Sûriyê ku ber bi Bendava Tişrînê ve diçûn û daxwaza rawestandina êrîşên berdewam dikin.”

Her wiha hate gotin ku dagirkerî ji bombabarankirina sivîlên bêguneh dudilî nebû, ku bû sedema şehîdbûn û birîndarbûna bi dehan kesî, di nav wan de rêvebera Meclîsa Jinan a Zenobîa şehîd Kerem El-Hemad.

Her wiha bal kişandin ser hedefgirtina jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve û ev yek weke êrîşeke metirsîdar û binpêkirina nixên mirovahiyê nixandin.

Wan diyar kirin ku şehîd Karam di Kombûna Jinan a Zenobî de pêşengek girîng bû û bû sembola têkoşîna ji bo azadî û mafên jinan û kesayetê îlham a ku hewl dide civakek demokratîk ku nixên edalet û wekhevîyê pêş dixê. û hedefgirtina wê sûcekî ducarî ye, sûcê li dijî mirovahiyê ye û sûcekî li dijî nixên azadiyê yên ku ew temsîl dike, ji bo bêdengkirina dengê jinên ku ji bo pêşerojê baştir têdikoşin jî weke hewldaneke xirap nixand.

Her wiha bal kişandin ser vê yekê ku bêdengiya navdewletî ya li hemberî van binpêkirinan tenê dibe alîkar ku Tirkiye bi polîtîkayên xwe yên tepeserker û sûcdar bi pêş ve biçê.



Di daxuyaniyê de hate gotin ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker a li ser bendavê red dikin û destnîşan kirin ku tevgerên jinan van êrîşên hovane yên li dijî sivîlan bi giştî û jinan bi taybetî dikin hedef, ku nîşaneya hedefgirtina azadiya jin û civakê ye, bi tundî şermezar dikin. Wan bang li Hevbendiya Navdewletî, Netewên Yekgirtî, rêxistinên mirovî yên navdewletî û xwecihî û hemû aliyên di warê mirovî de kir, ku bi lez û bez bikevin bendava Tişrîn ji bombebarankirin û êrîşan, û rawestandina êrîşên sistematîk li ser giring binesaziya bakurê û rojhilatê Sûriyê.

Ji têkoşerên jin re soza berdewamkirina rêya têkoşîn û şhadetê heta ku azadî, edalet û wekhevî pêk were, berdewam bikin.

Her wiha bang li hemû jinan kirin ku dengê xwe bilind bikin û gotin ku îradeya azad a jinê çeka li dijî neheqiyê û temînata avakirina civakeke adil e.

Wan daxwaza vekirina vekolîneke navdewletî ya serbixwe li ser van tawanên û derxistina berpîrsên dadgehê kirin, û herwiha sepandina cezayên bergiriyê li ser Tirkiyê ji bo rawestandina binpêkirinên wê yên êşkere.

Di encamnameyê de wiha hate gotin: “Jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wê ji têkoşîna xwe ya rewa ya azadî û rûmetê neyên jibîrkirin û wê weke sembola têkoşîna jinan a ji bo azadî û edaletê bimîne.

Jinên herêmên Bakur
û Rojhilatê Sûriyê
modeleke ku hemû
jinên cîhanê jê re
dixwazin



Tevgera Heyva Zêrîn li parêzgeha Reqayê li herêma bakur-rojhilatê Sûriyê daxuyaniyek ji raya giştî re da, tê de tekezî li ser giringiya beşdarbûna jinan di hemû warên jiyanê de, bi taybet di warê wêjeyî û çandî de, ku bi destlênedanên jinên xwende di avakirina Sûriyeya nû a paşerojê de geş dibe.

Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: “Ji demên kevnar ve, jinan di vejîna civakan de roleke sereke lîstine û bi beşdarbûna xwe hêza xwe ya guhertinê îsbat kiriye, ji ber ku ew di warên cuda yên jiyanê de hêmanên avakirinê ne , Rola wê ya herî girîng avakirina malbat û civakê ye û diyar kir ku jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bûne modela yekbûyî ya ku hemû jinên Rojhilata Navîn û cîhanê dixwazin Di hemû qadên jiyanê de cihê xwe bigirin û hemû hêviyên jinên têkoşer û hîn jî têdikoşin temsîl dikin da ku karibin di rêvebirina civakê de bibin xwedî rol.”



Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li kêleka mêran disekin û hemû erkên xwe yên pratîkî pêk tînin û wiha hate gotin: “Ji ber ku jinan gelek serkeftin û armanc bi dest xistine, ya yekemîn rizgarbûna ji tarîtiya DAIŞ’ê ye û ya

duyemîn jî derbaskirina zîhniyeta mêr a ku mezinahiya wan kêr dikir û rolên wan biçûk dixist.”

Di daxuyaniyê de hate gotin, “Îro piştî rûxandina rejîma berê ya Sûriyê ku bi zanebûn jin ji rola wê ya rastîn dûrxist, dem hatiye ku jin rola xwe ya bibandor û pêşeng bigirin û bibin beşek ji Sûriyeya nû.”

Her wiha bal hat kişandin ser pêwîstiya sepandina edalet û wekhevîyê di navbera hemû pêkhateyên civakê de, bêtir cudahiya zayend, nijad, ol, bawerî û temen, bi taybetî jî beşdarbûna jinan di hemû warên jiyanê de hate tekezkirin. Sûriyeya nû.”



Bîranîna şehîdên Komkujiya Parîsê li Rojava/Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Rêxistin û tevgerên jinan ên Rojava/Bakur û
Rojhilatê Sûriyeyê ji bo bîranîna şehîdên
komkujiya Parîsê Sakina Cansiz, Fîdan Dogan û

Leyla Çalmez ên ku di 9'ê Çileyê 2013'an de li paytexta Fransa Parîsê ji aliyê îstîxbarata dewleta Tirk a dagirker ve hatin qetilkirin , gelek civîn li dar xistin.

û Wan soza şopandina rêya her sê şehîdan heta bigihêje armancên xwe yên azadî û rizgariyê dan , Civîn bi deqeyek rêzgirtin ser rihê hersê şehîdan û hemû şehîdên azadiyê destpê kir.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku dewleta Tirk a dagirker jinên li dijî desthilatdariyên mêr ên serdest li ber xwe didin dike hedef ,

û bi nav kirin ku
Komkujiya Parîsê weke
dirêjkirina komploya
navdewletî ya li dijî
Rêber Abdullah
Ocalan ku li dijî
neheqiyê dengê gelan
û jinan temsîl dike.



Jinan destnîşan kirin ku jin îlham û hêza xwe ji têkoşîna Rêber Sakîne Cansiz digirin , û destnîşan kirin ku heta bigihije armancên xwe yên azadiya gelê xwe û doza xwe wê şopdarên rêya wê bin.

Ji bilî nîşandana vîdeoyekê (fîlmek) ku tê de beş ji jînenîgariya her sê şehîdan û têkoşîna wan di nava tevgera azadiyê de, bi heyama têkoşîna wan li Parîsê û heta roja şehadeta wan di 9ê Çileyê 2013an de bi dawî bû. Di dawiyê de jin û mêrên beşdar dirûşma "Jin, jiyana, azadî" berz kirin.



**Gelê Qamişlo û Heseke bi meşeke girseyî
şehîdên komkujiya Parîsê bi bîr anîn.**

Bi dirûşmeya “Bi berxwedana Sakîne Cansiz em ê têkoşîna xwe mezin bikin” bi sedan şênîyên bajarên Qamişlo û Heseke bi boneya 12’emîn salvegera şhadeta jinên têkoşer Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leylayê bi bîr anîn. Çalmez.



Kongra Star meşeke girseyî li dar xist ku bi sedan şênîyên bajarên Heseke û Qamişlo û gelek nûnerên tevgerên jinan tevlî bûn. Wan amaje bi wê yekê kirin ku “Komkujiya Parîsê ku di 9’ê Çîleya 2013’an de pêk hat, ji aliyê îstîxbarata Tirk ve li paytexta Fransa Parîsê pêk hat û di encamê de 3 jinên Kurd ên ku di misogerkirina azadiya jinê û rêxistinbûna jinan de rol lîstin hatin qetilkirin , Bîranîneke bi êş ji bo hemû jinên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk anî, lewma em vê komkujiyê şermezar dikin, bi taybetî ku li yek ji welatên Ewropayê ku daxwaza mafên mirovan dike û xwe parêzvanê van mafan dibîne.” Wan amaje bi wê yekê jî kirin ku "ev komkuji careke din hat dubarekirin û gelek kes di nav de şehîd Avîn Koyî jiyana xwe ji dest dan," Her wiha gotin, "Çalakiya wan a îro ji bo bibîranîna şehîdan, şermezarkirina van komkujiyan, piştgirîkirina berxwedan û hêzên Jin û Yekîneyên Parastina Gel e." Dagirkeriya Tirk hê jî li hemberî gelê Kurd gelek komkujiyan pêk tîne û ti rêgiryê jê re nîne.

Daxwaz kirin ku dawî li hemû binpêkirin û pêkanînên dagirkeriya Tirk were, ku armanca wê têkbirina binesaziyê ye, ji ber ku armanca wê şikandina vîna me û têkbirina projeya me ya demokratîk e, bi sûdwegirtina ji bêdengiya navneteweyî, bila Erdogan û çeteyên wî bizane ku em. dê teslîm nebin û dest ji parastina herêmên xwe bernedin.



Em hêza xwe ji nêzîkatiya Rêber Abdullah Ocalan û ramana wî ya têkoşînê digirin û heta azad nebe û negihêje azadiya xwe, ew rêberê ku xwe feda kiriye, bi qasî ku em xwedî azadiyê ne û bi qasî hêza me azad be.”

**Civîneke berfireh ji bo nîqaşkirina avakirina
Sûriyeyê nû û tevlîkirina jinan di şekildana
taybetiyên Sûriyeyê pêşerojê de**



Meclisa Jinan a Zenobia civîneke berfireh ji jinan re organîze kir, ji bo ravekirina pêşhatên siyasî yên dawî li Sûriyê û gotûbêjkirina beşdariya jinên Sûriyê di çespendina taybetmendiyan pêşeroja Sûriyê de.

Civîn li Reqayê bi amadebûna herî kêm 300 jinan hate lidarxistin , civîn bi deqeyek rêzgirtina beşdarî destpê kir, piştê rêvebera Kombûna Jinan a Zenobia Kerem El-Hemed a ku di 8'ê Çile de di êrîşa balafirên keşfê yên dewleta Tirk a dagirker de li ser konvoya ku ber bi Bendava Tişrinê ve diçû şehîd bû, hate bîranîn. , û hemû şehîdên jin û mêrên azadiyê.

Wan behsa pêşhatên dawî yên siyasî û leşkerî li Sûriyê kirin , û gotin: "Îro em rûbirûyê qonaxê nû ne ku çarenivîsa me weke jin û mêrên sûrî diyar dîke" û bal kişandin ser wê yekê ku analîzkirina rewşa niha "pir girîng e ji bo van xetereyan derbas bikin."

Wan amajê bi armancên şoreşa 19ê Tîrmeha 2012an kirin û gotin: "Dema şoreşê dest pê kir, armanca wê ew bû ku Sûriyan bi serbilindî û bi rûmet bijîn, dadperweriya civakî û demokrasîyê bi dest bixin, mafên pêkhatayan biparêzin û bigihêjin zayenda civakî û wekhevî."

Wan diyar kirin ku têkoşîna gelên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di encama projeya Rêveberiya Xweser de ku azadiya jinê li dijî zîhnîyeta mêtînger esas digire.

Wan bal kişandin ser wê yekê ku divê rejîma nû li Sûriyê van xalan li ber çavan bigire û rêzê li azadiya jinan bigire, û bal kişandin ser hejmara binpêkirinên ku di van demên dawî de li hin herêmên Sûriyê rastî jinan hatine.

Wan bang li jinan kir ku dengê xwe bilind bikin da ku mafên xwe di Sûriya paşerojê de bixwazin û dest ji wan bernedin, û beşdarî proseya niştimanî ya pêkhatina taybetmendiyan Sûriya paşerojê bibin, di heman demê de berdewam in li lidarxistina civînan bi vî rengî yên berfireh li bajar û parêzgehên herêma bakur û rojhilatê Sûriyê.



**Têkoşîna Du Dehsalan
Kongra Star bi boneya
salvegera
damezrandina xwe li
jinan pîroz kir**

Kongra Star bi boneya 20 saliya damezrandina xwe ya ku her sal di 16ê Çile de derbas dibe, daxuyaniyek da raya giştî. Di metna daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Bi boneya 20’emîn salvegera damezrandina Kongra

Star em li hemû jinên ku di qadên azadiyê de li ser felsefeya “Jin, jîyan, azadî” têdikoşin û li berxwe didin, pîroz dikin. em berxwedana şervanên Yekîneyên Parastina Jin ên li bendava Tişrîn û Pira Qerqaqozak silav dikin.

Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û gelên wê li hemberî êrîşên mezin ên sala 2024’an rastî berxwedaneke dîrokî hatin û li hember van êrîşan berdêlên mezin dan.

Em îro hemû hevrêyên xwe yê şehîd simbolên azadiya jinê bi rêz û hurmet bi bîr tînin û soza şopandina rêya wan nû dikin.

Kongra Star di nava 20 salan de li hemberî hemû zîhniyetên neteweyî, olî, zayendî û dagirkeriyê rêya xwe ya dîrokî ya berxwedan, qehremantî û fedekariyê berdewam kir û li gorî têgihiştinê wê nêzîkatiya parastinê bişopîne. Şerê Şoreşgerî yê Gel di sala xwe ya 21 de .

Kongra Star bi salan berpirsariya xwe gihand hemû jinan û pêşengiya wan kir û fêkiyên vê têkoşinê bi pêşengiya jinên Kurd bi şoreşa 19’ê Tîrmehê gihaşt hemû jinan û ji bo hemû jinên Ereb, Çerkez , Ermenî û Êzidî bû hêviyê .

Rizgarkirina Sûriyê di dawiya sala borî de ji rêjîma Baas gaveke girîng e di dîroka me de, ji ber ku me bi salan li dijî zihniyeta Baasê ya ku jin dorpeç kiriye û mafên wan ên di destûrê de ji dest daye,

Jinan bi biryardariya xwe ya mezin a li hemberî xwe û bi ezmûna xwerêveberiyê îspat kiriye ku ji perwerdeyê heta aborî, dîplomasî û siyasî û ji komunan heta meclîsan di şoreşa jinê de û di hemû qadên jiyanê de dikarin gavên mezin bavêjin. li gor pergala serokatîya hevpar û li ser esasê temsîliyeta wekhev a di navbera zayendan de.

Di vê qonaxa dîrokî ya ku em tê re derbas dibin, em bang li hemû jinan dikin ku bi yekitiyê destkeftiyên şoreşa jinê biparêzin û Sûriyeke piralî û demokratîk ku hebûn û îradeya jinan li gorî destûra bingehîn a Sûriyê diparêze ava bikin .

Ji ber vê em dibêjin na ji dîktatoriya Baas re , na ji rejîma tundrew a olî, jin, jiyana û azadiyê .

Jin di 20 salvegera damezrandina Kongra Star de soza mezinkirina têkoşîna xwe didin



Kongra Star bi boneya 20'emîn salvegera damezrandina xwe ya ku her sal di 16'ê Çile de ye, li taxên Şêx Meqsûd û Exrefiyê yên bajarê Helebê rêzecivîn li dar xist.

Endam û nûnerên tevger û rêxistinên jinan li navendên meclîsên jinan li hev civiyan û beşdarî civînên li dar xistin.

Civîn bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir û piştê bi axaftinên hatin pîrozkirin bidawîbûna têkoşîna 20 salan a Kongreya Star a ji bo azadiya jinê hate pîrozkirin û hemû şehîdên azadiyê yên ku ji bo azadiya zayenda xwe ji koletî û çewisandinê canê xwe feda kirine, bi bîr anîn. û Ji bo piştevanê azadiya jinê û nivîskarê tezên ku rola jinan di avakirina civakan de bilind bikin, Rêber Abdullah Ocalan peyama spasîyê şandin. Dîmenên têkoşîna ku şervanên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) li Pira Qereqûzakê û Bendava Tîşrînê li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê nîşan kirin .

Her wiha bal kişandin ser bîrdoziya ku Kongra Star di birêxistinîkirina xwe û endamên xwe de dişopîne û wiha got: “Ji hemû jinan re ji hemû gel, çand û bawerîyan re, ji bo hevgirtin û vîna azad a hevpar esas girtin.



salvegera 20 emîn a damezrandina Kongra Star li Qamişlo



Kongra Star a bajarê Qamişlo bi boneya 20'emîn salvegera damezrandina xwe bi dirûşmeya "Bi ruhê Sûzdar, Kerem û Cîhan. Bi felsefeya jin, jiyana û azadiyê em ê leza têkoşîna xwe mezin bikin" şahiyek li dar xist ."



Pîrozbahiyê bi deqeyek rêzgirtinê destpê kir, piştî Berdevka Kongra Star Rêhan Luqo axivî û berxwedana Bendava Tişrînê silav kir , Her wiha şehîdên pêşeng Sozdar Cîhad, Cîhan Belkîn û Karam El-Hemad ên di êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk a li ser herêmê de şehîd bûne bi bîr anî û soza pêkanîna xeyalên wan da.



û Reyhan Luqo bi heman boneyê li Rêber Abdullah Ocalan pîroz kir. Wê bal kişand ser wê yekê ku Kongra Star di sala 2005'an de ji aliyê komek jin ve hat damezrandin, di demê de ku rejîma zordar hewl dida siyasetên xwe yên zordar li ser jinan ferz bike, û niha bi rêxistinên bûye heta îro bi hezaran jin di nav xwe de dihevin. Her wiha got: "Niha Kongra Star fêkiyên serkeftinên xwe yên ku bi saya xwîna jinên karsaz li her deverê bi dest xistine didirû û Kongra Star bûye bingeha hemû rêxistinên jinan."



Paşê axaftinên beşdaran hatin kirin û der barê êş û azarên jinan de, bi biçûkxistina wan, hewldana şermezarkirina wan û nedayîna mafên wan ên herî rewa, herî baş delîlên vê yekê anîn ziman serjimêriya nehiqûqî ya şêst salî û derxistina hemwelatiya Sûriyê ji gelek jinan re wiha got: “Ev hemû bûn sedem û motîvasyonê ji bo şikandina astengiya terorê û israra ji bo bidestxistina azadî û rûmeta xwe. Ji bilî pêşkêşkirina strana bi navê Hilal El-Zehebî û lidarxistina dewreyên Debkê di nava coşeke mezin a jinan de.

Ji aliyê saziyên jinan ve jî gelek telgrafên pîrozbahiyê ji Kongra Star re hatin şandin.

Li ser navê Kombûna Jinan a Zenobîa ji aliyê Koordînasyona Kongra Star Jian Hisên ve daxuyanî hat xwendin.





Peyama koçberên Serêkaniyê ji Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî re

Ji bo daxwaza mafê vegera bi ewle ji bo herêmên xwe û ji bo dengê xwe bigihînin civaka navneteweyî, bi sedan zarok, jin û mêrên koçberên bajarê Serê Kaniyê yê kantona Cezîrê ya dagirkirî li ber avahiya Neteweyên Yekbûyî xwepêşandaneke li dar xistin. Li bajarê Qamişlo .

Xwepêşandêran li ber Stadyûma Şehîd 12'ê Adarê ketin rê, ber bi navenda Neteweyên Yekbûyî ve ketin rê û pankartên bi nivîsên “Daxwaza me bidawîkirina dagirkeriyê ye”, “Em bang li Neteweyên Yekbûyî dikin ku dawî li êş û azarên koçberan bîne.” Koçberî sêkê berdewam e, “Na ji guhertina demografîk re” û wêneyên binpêkirinên dewleta Tirk ên li bajarê Serê Kaniyê û îfadeyên ku daxwaza rawestandina dagirkeriyê dikin û bi ewle vedigerin bajarê; Serêkaniyê (Ras al-Ayn), Girê Spî (Tal Abyad) û Efrînê.



Piştî hatina wan li ber baregeha Netewên Yekgirtî, deqeyek rêz girtin, piştîre nameyek ji Sekreterê Giştî yê Netewên Yekgirtî re bi zimanê Erebî û Kurdî hate xwendin ku têde bû:

Temînkirina vegera ewle û dilxwazî ya kesên jicîhûwarkirî di bin parastina navdewletî de.

Hemî astengiyên vegeerê rakin û piştrast bikin ku nakokî di pêşerojê de dubare nebin , Çêkirina nexşerêyeke zelal di bin çavdêriya Netewên Yekgirtî de, li gor yasayên navdewletî û Peymana Netewên Yekgirtî , Ji nû ve avakirina dezgehên bingehîn, wek av, elektrîk, paqijî, rê, dibistan û navendên tenduristiyê.

- Qezmînkirina kesên ziyandar di warê aborî de û jinûveavakirina mal û dezgehên wêrankirî.

- Berpirsiyarên bînpêkirinên ku bûne sedema koçkirina me ya bi darê zorê , Piştgiriya herêmê di warê aborî de û peydakirina derfetên kar ji bo civakan ku vegeerin.

Hêsankirina wergirtina belgeyên şexsî û milkên kesên jicîhûwarkirî. Xwepêşandêran li ber avahiya Neteweyan soza mezinkirina têkoşînê û çalakiya rûniştinê û çalakiyan heta ku vegeerin herêmên xwe yên dagirkirî, li dar bixin.



**Meşên girseyî ji bo piştgiriya
Hêzên Sûriyeya Demokratîk
û şermezarkirina êrîşên
dewleta Tirk a dagirker li ser
bendava Tişrîn**

Bi hezaran şênîyên Rojava/Bakur û Rojhilatê Sûriyê daketin qadan , ji bo piştgiriya Hêzên Sûriyeya Demokratîk û cîgirên sivîl ên li ser Bendava Tişrînê û şermezarkirina êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên li ser xaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin .

Beşdarên gelek dirûşmeyên "Bijî Berxwedana QSD'ê, Sûriyeya azad, gelê Sûriyê yek e, em tîna Efrîn" û dirûşmeyên din berz kirin.

Piştî deqeyek rêzgirtinê, bal hat kişandin ser qehremaniya Hêzên Sûriyeya Demokratîk di bendava Tişrînê de, da ku hemû pêkhatiyên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di nava aramî û ewlehiyê de bijîn. Her wiha destnîşan kirin ku beşdarbûna pêkhatiyên herêmê di van meşan de peyamek ji cîhanê re ye ku Hêzên Sûriyeya Demokratîk parêzvanê rastîn ê hemû pêkhate û mezheban e.

"Armanckirina bendava Tişrînê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve bi armanca têkbirina jiyana şênîyan e, lê Hêzên Sûriyeya Demokratîk parastina wan û ewlekariya wan berdewam dike."





